EZ BI TE DIMIRIM

Ferûx Ferûxzad

Ez bi te dimirim
Belê! Tu jiyana min bûyî
Tu li gel min diçûyî
Te di hundirê min de dixwend
Demê min şeqam bêyî hîç armanc dipîvan
Tu li gel min diçûyî
Te di hundirê min de dixwend
Te di nav Narvena çîçikên evînê
bi spêdeya penceran mêvan dikirin
Demê şev dubare dibûn
Demê şev xilas nedibûn
te di nav Narvena çîçikên evînê de

bi spêdeya penceran mêvan dikirin
Tu li gel fenerokên dihatiye kolana mala me
Tu li gel fenerokên xwe dihatî
Demê zarok diçûn
Wişiyên Aqaqiyan dinivistin
Ez bi tenê di nav neynikê de dimame ve
Tu li gel fenerokên xwe dihatî
Te destên xwe didane min
Te çavên xwe didane min
Te dilovanî dida min
Demê ez birçî bama,
te jiyana xwe dida min
Tu wekî ronahiyê camêr bûyî
Te gulên rebenok diçandin û
te keziyên min pê diveşartin
Demê keziyên min ji ber tazîbûnê
dilerizîn
te gulên rebenok diçînin

Te rûmetên xwe bi lerzîna memikên
Min ve dinûsand
Demê min peyvêk dî
Ji bo peyvînê nedima
Te rûmetên xwe bilerzîna memikên
min ve dinûsand

Te guhê dayê
Xwîna min bi nalîn diçû û
Evîna min bi şînî û girî diçû
Te guhê xwe didayê
Lê te ez nedidîtim.

Wergêra ji farisî:Sadiq Salih